

Paşegerandina xercên bijjîkî bi riya sûdên temamker

1. Pîvanên mercdarbûnê

Kesên ku di heman serdemê de mafê wergirtina sûdên mehane yên temamker hene, xwedî maf in ku lêçûnên bijîşkî yên ku nehatine dayîn wergirin. Eger kesek ji ber zêdebûneke dahatê ji sûdên temamker hatiye redkirin, lêçûnên bijîşkî yên îsbatkirî dikarin piştî kêmkirina zêdeya dahatê werin vegerandin.

Tenê lêçûnên ku li Swîsê tên dayîn dikarin werin vegerandin. Lêçûnên ku li derveyî welêt tên dayîn, eger di dema mayîna we ya li derveyî welêt de hewce bibin, dikarin wekî awarte bên hesabandin.

2. Dayîna belgeyan / dawîya demê

Ji bo ku lêçûn werin vegerandin, pêdivî ye ku hemû belge sê mehan carekê ji Daîreya Pîrbûnê û Sîgorteyê ya Bajarê Bernê, AHV-Zweigstelle, Bundesgasse 33, 3011 Bern re werin şandin.

Vegerandina lêçûn divê di nav 15 mehan de ji dayîna fatûreyê yan jî daxuyaniya ji pargîdaniya sîgorteya tenduristiyê were xwestin.

3. Xercên vegerbar ên nexweşiyê û kêmendambûnê

- Mesrefên sîgorteya tenduristiyê ji sîgorteya tenduristiyê ya mecbûrî KVG

Rêjeya kêmkirinbar û 10% zêdeyî heya qaseke salane ya 1,000 CHF / ji bo zarokan 350 CHF, li ser bingeha îfadeyên kesane, bêkêmasî yên pargîdaniya sîgorteya tenduristiyê.

- Dermanên diranan

Mesrefên dermankirina diranan tenê bi qasî ku ew li gorî dermankirineke taqetbar û guncaw tevdiqerî dikarin bên hesabandin. Zelalkirinên guncav ji hêla nivîsgeha tezmînatê ya kantonê ve li gorî fatûreyên hatine şandin an texmînên lêçûnê tên kirin.

Eger tê çaverêkirin ku lêçûnên dermankirina diranan a plankirî ji 1,500 CHF derbas bibe, divê berî dermankirinê texmîneke lêçûnê bi forma diranan (rewşa diranan) were şandin. Pêdivî ye ku hejmara diranan jî li ser fatûre û texmînen lêçûnê bên diyarkirin. Dema ku ji bo cara yekem fatûreya diranan tê şandin forma diranan hewce ye.

Di heman demê de, ji bo çêkirinên plansazkirî yên bi dermankirina kanalên rehê, tac, çandin, danînen hundir, danînen ser, pirekirin, kapikên kanalên rehê, tê pêşniyarkirin ku ji bo vekolîna berî dermankirinê texmîneke lêçûnê bi forma diranan re were şandin. Rêzên rênîşandanên din ên li ser celebê fatûreyê dikarin di rûpela zanyariyên bo diranan, ku li nivîsgeha şaxê AHV an li ser vê malperê bibînin www.akbern.ch.

- Veguhestina bo nêzîktirîn navenda dermankirina bijîşkî

Ji bo vegerandina lêçûnên veguhestina bo navenda dermankirina bijîşkî ya herî nêzîk, divê lêçûn li ser formekê bên berhevkirin. Vegerandina lêçûnên veguhestina

taksiyê/Betax/erebeya taybet tenê wê demê mimkun e ku belgeya bijîjkî piştrast bike ku veguhastina giştî nayê bikaranîn. Form û belavok li nivîsgeha şaxa AHVyê hene.

- **Perestari û muqateya ji aliyê endamê malbatê ve** ku li temenê AHV nîne û li hesabên EL de nayê anîn.
Bo lînhêrîna bingeîn a pêwîst ku ji hêla endamên malbatê ve tên kirin, mîna lînhêrîna dev û laş, nivîn, cîhgirtin, hereketkirin, hwd., serê saetê bi 25 CHF heya herî zêde 9,600 CHF salê tê dayîn.
Xizmetên lînhêrînê yên ku di lêçûnên nexweşiya EL de tên naskirin (eger mafê we heye ku hûn diravê nedarbûnê bistînin) bi rêjeya demjimêrek 25 CHF û herî zêde bi qasî diravê ku we daye tê vegeandin. Divê delîlên dayîna dirêv yên rastîn hebin. Ev di heman demê de dibe sedema neçarkirina dayîna xercên sîgorteya civakî yên neçarî (AHV/IV hwd.) û berpirsiyariyên bacê yên tîkildar.
Formên pêwîst ên ji bo zelalkirina hewcedariyan li navenda şaxa AHV an jî li vê malperê hene www.akbern.ch Wekî din, bawernameya bijîjkî digel belgeya hewcedariya alîkariyê û lînhêrîna li malê hewce ye.
- **Yarmetiya li malê ji aliyê dezgeh û kesên li malekê de najîn**
Yarmetiya li malê ji hêla karûbarên Spitex ve piştî radestkirina nixandineke hewcedariyê û bawernameya bijîjkî heya 9,600 CHF li salê.
Eger endamên malbatê yan jî aliyên sêyemîn karê lînhêrîna malê ya pêwîst pêk bînin, lêçûnên raporkirî yên fatûreyê dikarin salê heta 4,800 CHF (her saetê 25 CHF) werin dayîn. Li vir jî, divê bawernameya bijîşkekî ku hewcedariya alîkariya malê piştrast dike were pêşkêşkirin. Ji bilî vê, kesê ku xizmetê dike divê di heman malê de nemîne.
- **Amûr & Cîhaz**
Lêçûnên ji bo alîkariyên ku bi qismî ji hêla AHV ve tên diravdayîn (kursiya bi teker, pêlavên ortopedîkî yên xweser û standard, alavên bijîjkî yên rû, kumê sexte, amûrên bihîstinê, arîkariya axaftinê, berçavkên mezinkirinê) û berçavkên ava sipî.
- **Bêhnvedanê li mala extiyaran an nexweşxaneyê**
- **Dermanên sersûştinê û rihetbûnê yên ku ji hêla bijîşkî ve hatine destnîşankirin**
- **Perestari û muqateya li navendên muqateya rojane**
- **Arîkariya nexweûan bo muqateya Spitex**
- **Parêza bijîşkî li malê**
Mesrefa zêde ya ji bo parêzeke ji hêla bijîşkî ve li malê hewce ye (xwarin ji bilî yên ji bo nexweşiya şekir) hatiye ragihandin.

4. Qasa herî zêde ya dayîna dirêv

Ji xeynî sûdên temamker yên salane, ji bo lêçûnên nexweşî û seqetiyê yên îsbatkirî di her saleke salnameyê de herî zêde qasên jêrîn dikarin werin dayîn:

- Kesê nezewicî CHF 25,000
- Kesên zewicî CHF 50,000
- Kesê li mala extiyaran dimîne CHF 6,000